# SERHATÎYA KURÊ AVÎ

Du kurên mirovekî hebûn, Yê biçûk ji bavê xwe re got:
„Bavo, ji hebûna te yê  ku para min e (dikeve) bide min.“
Û wî hebûna xwe  li herdu kurên xwe leva kir.



Çend kurên wî mirovî hebûn?


..........................................................

Piştî cend rojan kurê biçûk, çi ku para wî ketibû firot, wî pere birin  û çû welatekî dûr.
Li wir bi jiyana nepaqij derbaz kir. Çaxê hemû hebûna wî xilaz bû, di wî welatî de xelayîkê giran dest pê bû. Kurê biçûk jî kete halekî giran.



Kurê biçûk ku derê çû ?
........................................................


Ew çû cem bajarvanekî wî welatî û evî jî ew şand ber berazan. Wî dixwest zikê xwe bi xureka berazan têr bike, ew jî nedidanê.



Xort ku derê hat şandinê?

.............................................................

Êdî wî di dilê xwe de got: “Çiqas mirov  di mala bavê min de dixebitin û nanê wan heye? Lê ez  li vir ji birçînê dimirim. Ezê rabim herim cem bavê xwe û bêjimê: Bavo, min ber ezmên û ber te guneh kir, êdî ez ne hêja me, ku kurê te bim, wek karkerekî xwe min qebûl bike.”



Kur ber ezmên û ber bave xwe çawa bû?

............................................................

Rabû hat cem bavê xwe û Bav ji  dûr ve  bû, kurê xwe dît. Dilê wî pê şewitî, rabû û pêşîya wî da bezî, ew himbêzkir û ramûsa. Kur ji bav re got: „Bavo, min ber ezmên û ber te guneh kir, êdî ez nehêja me kurê te bibim."



Çaxê ew hat cem bavê xwe, bavê wî çi kir?

.........................................................

Bav ji xulamên xwe re got: “Zû, kincên ji wî bixin û yên teze lê bikin, gustîlkê bikin tilîya wî, solên nû jî lazim in. .”



Bav ji xulamên xwe re got ku çi bidine kur ?

.........................................................

“Conegayê bînin serjêkin, da ku em bixwin û şa bin, çimkî ev kurê min mirî bû û sax bû, windabûyî bû û va ye hat dîtin. Û dest bi şahiyê kirin.



Çima bav şa bû?

........................................................

Lê kurê wî yê mezin li ser cot bû û gava nêzîkî malê dibû, dengê strana û lîstikê bihîst. Ji xulaman yek gazî cem xwe kir û jê pirsî: “Ev çi hewal e?“
„Birê te hatiye, bavê te conegayê serjê kir, çimkî sax-silamet ew dît.“
Birê mezin hêrs ket û nedixwest biketa malê.



Çaxê birê mezin fêm kir ku birê wî sax-silamet hate malê, ew jî şa bû?

...........................................................

Hingê bavê wî derket derve, hêvî jê dikir.
Kur got: „Hewqas sal ez tera xebatê dikim û tu cara ji gotina te derneketime, lê te kerikek jî ne da min, ku tevî hevalên xwe şa bibim. Çaxê ev kurê te hat, yê ku malê te ser qaba xerç kir, te gayê goştî bona wî serjê kir.“



Kurê mezin li birayê xwe yê vegerî hez kir?
..........................................................

Bavê jê re got: „Lawo, tu tim û tim bi min re yî û her çiyê min heye ya te ye, lê divê em şahiyê bikin û dilxweş bibin, çimkî ev birayê te mirî bûû vaye ew û sax bûye,ew  undabûyî bû û dîsa hatiye dîtin.“



Her çi bavê heye ya kê ye?

...................................................